Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

**Xebat ji bo :** * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *we\anên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* Newroz95@hotmail.com

Hejmar(64) Çirya pêşîn 2005 z-2617 k Buha ( 15 ) p|s


## Li Şamê kurd û Ereb bi hev re….

**Li** – 16- ey meha çiriya yekê (oktober ) 2005 – an , daxuyaniyeke dîrokî bi navê daxuyaniya Şamê ( îlan Dîmeşq ) dihate îmzekirin û hema pê re jî, ragihandin û Medya cîhanî û ya Erebî _ ji bilî ya rêjîma sûrî _ ev bûyera he dikirine manşêt û bi tîpên stûr bi xelkê temaşevan , guhdar û xwendevanan didane zanîn , ji bilî rûpelên malperan yên ku di sîngên wan de evê nûçeyê bi balkêşî cî digirt û di nav piraniya xelkê sûriyê de dibû ciyê kêfxweşî û hêviyan.

( JI BO GUHARTINA NIŞTIMANÎ YA DEMOKRATÎK )

ev daxuyana me hatibû bi navkirin û yên ku îmzên xwe avêtibûne binê wê ev partî , rêxistin û kesayetî bûn :

- Kombûna nişîmanî ya demokratîk li Sûriyê .
- Hevbenda demokrat ya kurd li Sûriyê .
- Komîteyên vejîna komelgeha Şaristanî .
- Berê demokratîk a kurd li Sûriyê .
- Parta pêşerojê ( Şêx newaf el - BeŞîr ) .

Birêz Riyad sêf ( di girtîgehê de ) - Birêz Cewdet se'îd -Dr. Ebdirezaq îd - Semîr el –Neşar , Dr. Fîda Ekrem el_Horanî , Dr. Adil zekar , Ebdilkerîm el_dehak , Heysem el-Malih , Nayif Qeysiyê .

Hêjayî gotinê ye ku , di pê weşandina daxuyaniyê re , hinde hêz , partî û kesayetiyên Sûrî yên dî jî , çi li hundir û çi li derve , piştgiriya xwe bi daxuyaniyê re dane **D.R(11)**

## Mam Celala bi Kurdî axivî




Serokê Komara Iraqê birêz Mam Celal Talabanî li NewYorkê, di civîna giştî ya Neteweyên Yekbûyî de, bi zimanê kurdî axivî. Birêz Talabanî gotina xwe, bi erebî dets pê kir û di nîvî de, çend hevokên bi kurdî xwendin. Serok Talabanî bi kurdî got: "Birêzan, silavên xelkê Kurdistanê wek beşek ji gelê Iraqê li we tevan **dikim**." Birêz Talabanî herweha bi kurdî çend hevok li ser Kurdistana Iraqê gotin û diyar kir, bê çawa ew"nimûneyek e" ji bo demoqratî û azadiyê ye